# NE PROPAGANDA, MİZGÎNİYA AŞTİYÊ

# KÎ DİKARE TE RİZGAR BİKE?



Mustafa EFE

Müjde Yayıncılık

Ne propaganda, Mizgîniya Aştiyê;

# *Kî Dikare Te Rizgar Bike?*

**Mustafa EFE**
**Çeviren: Yakup Karademir**

**Müjde Yayıncılık Ltd. Şti.**
Vişne Sokak No:4/11
Kadıköy-İstanbul

© *Müjde Yayıncılık Ltd. Şti.* ne

**Müjde Yayıncılık Ltd. Şti.**
Vişne Sokak No: 4/11
Kadıköy/Istanbul
Tel: (216) 349 85 29
**E-Mail:** gnmmujde@Superonline.com

**ISBN 975- 7889- 89- X**

**Tîprêzî, amadekariya ofsetê** : Müjde Yayıncılık
**Berg** : Ajans Rapido
**Çap** : Kurtiş Ofset Matbaacılık 2001

## *Pêşgotin*

Roj dibihurin, dem tu dibêjî qey bûye çivîk û difire. Mirov ji diya xwe dibin, mirov dimirin. Lê dinya her berdewam e, digere. Herdem herikînek, herdem tevgerek. Icar tevî vê tevgerê, dîsa jî nîzamek, yekîtiyek heye. Di vê dema dibore û diçe de, em jî bêyî ku lê hay bibin di nav pirsên rojane de dijîn û diçin. Îcar di vê pêvajoyê de em han didin wesanên li ser mijarên nû, pêşkêşî we dikin. Em bi vê yekê pir kêfxweş dibin. Di eynî wextê de em pesnê Xwedayê xwe didin, ku em ji anîna holê û kesên ev wasîteya mizgîniyê ya xweşik teşwîq kirine.

Peyva Xwedê wusa dibêje: "*Hatina kesên ku mizgîniya nûçeyên xweş didin çendî xweş e.*" Bi rastî jî her peyv, kaxez, her wasîteya ku peva Xwedê tê de weke mizgîniyê tê dan, pirr xweşik û bedew e. Ji ber ku Xwedê bixwe; pîroz, tekûz û baş e.

Ev pirtûka ku me li ser vê armanca bingehîn amade kiriye û weşandiye di bin ewlehiya qanûnên Cumhûriyeta me ya laîk a welatê me yê ku Ataturk ew avakiriye de ye. Xizmeta Mizgîniyê ji perestgehên me yên ku em bi rihetî pereştina xwe lê dikin hete malên me, berdewam e.

Mebesta vê pirtûkê, divê ji serî de bê zanîn. Armanca me ne ku em wê bi awayekî çewt an jî weke wasîteyeke propagandayê, ji nav bisedan pirtûkên ku nêrîn û baweriyên cihê di wan de cîh digrin, di nav vê pirdengiya welatê me ya ku di merhela hevdemiyê de pêşbaziyê dike de, ji yên ku dixwazin Mesîh İsa nas bikin û yên ku bidin ser şopa wî re amadekirina çavkaniyeke alîkar e.

Em, milletek in ku têkiliyên wî yên navxweyî pirr bihêz û hevaldost in. Lê mixabin gelek caran kî ji me re çi bibêje em baweriya xwe pê tînin, hette tiştên ku nebûbin jî weke bûne dihesîbînin û li gor wê şirove dikin. Ev jî gelek caran him me, him jî civata ku em tê de dijîn di nav gêrineyeke sitûr de asê dike. Wê gavê hew te dît, me ji xwe re dinyayek wusa çêkiriye ku, êdî em bixwazin jî em ê nikaribin xwe ji dîlîtiya vê dinyê rizgar bikin.

Eve tam wexta wê ye, tu dixwazî em bawermendên Mesîh Îsa bin, dixwazî ji baweriyeke din bin, dinya ku di guhere, dinya hevdem dinyayek e ku derewan bi awayekî dijwar li ser çavan dixe, ji navê radike û qîmetê tiştan li gor rastiya tazî diyar dike. Wê gavê çima em ê hîn jî weke hêştirmeyê serê xwe têxin bin qûmê û bijîn?

Werin em bi hev re li hin qîmetên din bigerin, em bi hev re ji wan îstîfade bikin. Em rêz û hurmeta bîr û baweriyên we jî bigrin û di encamê de bêyî em jibîr bikin ku em mirov in, ya Xwedayê me yê xwediyê erd û ezman ê ku em bi coş zindî kirin, bi peyva xwe ya bi wasîteya Mesîh Îsa riya rizgariyê nîşanî me da, bigrin.

Yunus Emre dibêje, "*Kesê ku bi me nizane çi zane, silav li yên ku bi me dizanin.*" Bi peyva devê xelkê an jî bi tesîra hin bûyerên dîrokî, bêyî ku mirov bi awayekî rast lê bikole, sirf weke ku mirov ekîbeke futbolê hilbijêre bi zîhniyeta alîgirê ekîbekê rexnekirin û reşkirin hêsan e lê tiştê girîng, dan û stendineke fikrî ya li ser esasê lêkolînên rasteqîn a azadiya fikrî ye. Eve bi vê bîr û baweriyê, him ji birayên me yên li ser şopa Mesîh Îsa re him jî ji kesên ku bixwazin Îsa Mesîh nas bikin re bi aweyekî vekirî û zelal em dixwazin tiştinan pêşkêş bikin. Di eynî wextê de divê bêferîqet hûn zanibin ku ji xeynî xwêdana eniya me û Peyva Xwedayê me ya li ser zar û zimanê me pê ve, tu destên tarî li pişt vê pirtûkê ninin, armanc û niyeteke xirab tuneye.

Reşkirina bi salan a li dijî bawermendên Mesîhî yên ku dilê wan bi ser welat û birêvebiriya wan de ye û bi hevwelatîtiya Tirkiyê mexrûr dibin, me xemgîn dike. Jimara van mirovan dibe ku hindik be, îcar ji xwe ev ne ewenede girîng e. Lê Mesîhî ji bo Tirkiyê herdem dua dikin. Ev kesên ku li ser riya Mesîh Îsa ne, karmend in, karker in, xwendekar in, esnaf in, xanenişîn in. Pîşeyê van mirovan û karê ku ew dikin ne girîng e. Ya girîng ew e ku ji her beşên civatê kesên bi hezkirina Mesîh bijîn hebin.

Gava hûn rastî van mirovên ji her beşên civata me hatin, çi dibe li wan wek kesên ku ji ezmanan hatibin menêrin. Gava ku hûn Încîl an pirtûkek din a di derheqê Xiristiyaniyê de bibînin, çi dibe wê gavê mebêjin wasîteya propagandayê ye. Peyvên wek mîsyoner, mirovxapên, yên ku aqilê ciwanên me çelq dikin bikar mênin!

Çi dibe werin em carekê li dora xwe binêrin, welatê me jî tê de, li gelek welatên cîhanê ciwanên me di dafên alkol û narkotîkê de mane heyirî. Ger em qîmetên civatî, hezkirinê, rêzgirtinê bidin aliyekî, bihezaran ciwanên ku baweriya wan bi pêşeroja wan jî nemaye hene.

Li şûna ku em ji ber baweriyên wan ji mirovan, şik bikin û wan reş bikin, divê em rewşa ku ew dijîn fêm bikin. Dîsa ez dixwazim bi peyvên Yunus Emre yên xweş gotina xwe bidawî bînim.

***"Ilim, ilim zanîn e, ilim xwe zanîn e.***
***Tu bixwe nizanibî, ev çawa xwendin e.***
***Mana xwendinê çi ye, mafê mirov zanîn e.***
***Ger tu nizanibî ji bo çi dixwînî, renca te betal e!"***

Werin wê gavê em heqê her tistî teslîm bikin û tevbigerin. Mirovên li derdora xwe, bitaybetî jî ciwanên xwe bi hezkirina Xwedê perwerde bikin, ji bo millet û welatê xwe mezin bikin. Bi vê bîr û baweriyê werin em bibin perestgeha Xwedayî. Ji ber ku mirov bixwe perestgeha Xwedê ye.

Ger bedena mirovî perestgeha Xwedê be, hingê wê di bedena kesê perestgeha Xwedê de jî, ruhê Xwedê hebe. Ger di bedena kesekî de ruhê Xwedê hebe û hûn jî hîn wî kesî reş bikin, ev jî tê wê manê ku hûn bixwe nizanin hûn çi dikin.

Helbet bîr û bawerî her dem ji bo armancên kirêt hatine bikaranîn, helbet hin kesên ku bi rastî ne xwedî bawerî ne, weke xwedî bawerî bin çi û çi nekirine. Di nav hemî baweriyan de, gelek kesên ku bi rastî ne xwediyê wê baweriyê ne, lê

xwe weke ku vê baweriyê diparêzin nîşan didin hene û di dîrokê de mişêwa ji bo berjevendiyên xwe yên şexsî baweriya xwe ji bo polîtîka xwe bikaranîne. Ma mirov dikare gunehê van hemî çewtiyên vî kesî an van kesan têxe stuyê kesên din ên xwediyê vê baweriyê? Çawa ku mirov nikare tiştê ku kesekî kiribe têxe stuyê hemî civatê, çima wê li gel dareke hişk ewende darên ter bişewitin!..

Eve li ber ronahiya van rastiyan, ez bi pêşkêşî we kirina vê pirtûkê gellekî kêfxweş im. Ez ji niyeta xwe ya safî ber bi we ve têm. Dixwazin ji min bawer bikin an jî nekin, ez hezkirina xwe ya binavê Xwedê pêşkêşî we dikim.

Mirov çawa dê karibe dermanê ku mirov xelaskiriye pêşkêşî kesekî din neke? Herkes dê wusa neke? Niha ez jî eynî vî tistî dikim, ez Xwedayê me û Rizgarkerê me Mesîh Îsa pêşkêşî we dikim û niyaz dikim ku ji yên bi me dizanin re bibe silav!

Ez we dawetî xwendin û lê fikirîna bêpêşhukmî ya vê kitêba ku bi taybetî li ser we û li ser jiyana we ya ruhanî ye dikim.

Li gel bilindbûna bihabûna jiyanê ya van rojên dawîn, zêdebûna jimara medyûm û falbêjan ku wek kuvarikan derdikevin navê, bawerkirina mirovan a li şûna Xwedayê ku em anîne rûdinyê, çavdêriya me dike û me diparêze, bawerî anîna bi kesên wusa û domandina jiyana xwe li gor peyva devê wan, wê çendî lirê be gelo?

Ji bo sererastkirina kar û barê xwe, çareserkirina pirsên malbata xwe, ji bo zarok ji mirov re bibin li xetên telefonan ên

bi 900î destpê dikin gerîn, an jî bi ber bayê kesên ku xwe weke medyûm didin naskirin ketin, wê çi fêdê bide we?

Ev kesên dibêjin ku em li ser navê Xwedê alîkariya we dikin û rê nîşanî we didin û bi vê riyê milyarên ku qezenc dikin ji bo zewq û kêfê xerc dikin, çendî rast e?

Yê ku we ji vê rêzezincîra pirsan xelas bibe kî ye? Yê ku wê him li vê dinyayê û him jî li dinya wî aliyî hûzûrê bide we kî ye? Belbî niha bersiva helbet Xwedê ye di aqilê we re jî derbas dibe. Wê gavê falên ku nûçegîhanên magazînî bi kêfeke mezin dinivîsîn, medyûmên ku peyvên beradayî li dûv hev rêz dikin çendî dikarin riya we ronî bikin û we rihet bikin?

Dixwazin bawer bikin dixwazin mekin, dîsa jî ez dixwazim hin şahadetiyên ku min ji ber bûyerên bûyî berhevkirine, pêşkêşî we bikim. Dersa dawiya van bûyerên bûyî jî ji we xwendevanên xwe re dihêlim.

**Mustafa EFE**

## *Lê Ku Efû Bike?*

Axayekî gundî yê bi dewlemendiya xwe bi nav û deng hebûye. Ev axa ewende dewlemend bûye ku hed û hesabê serweta xwe jî nizanibûye. Li gel dewlemendiya wî, xelkê gundê wî jî deyndarê wî bûye. Xebata gundiyan a salekê saloqat, têra faîza faîza deynê wan jî nekiriye.

Rojekê axê nivîsek bi ser deriyê xwe dakiriye: ***"Kî ku sibê nîvro hete saet 12an hemî deynê xwe bêkêmasî li ser kaxezekê binivîse û bîne ez ê li hemî deynê wan bibuhurim. Îmze Axa."***

Hişê gundiyên ku ev nivîsa bi ser deriyê axê dakirî xwendine ji serê wan diçe, lê dîsa jî bêyî ku henekên xwe pê bikin sebra wan nehatiye. Gundî dibêjin: "*Xwiya ye axe xurifî ye û deftera ku deynê me lê nivîsiye wenda kiriye. Bi vî awayî wê zanibe bê ka çiqas deynê wî li kê heye.*" Hin gundî wusa dipeyivîn, hinan ji wan jî digot: "*Qet hûn tiştekî wusa nekin ha, divê em neçin deynê xwe ji axê re nebêjin, ger em bêjin wê deynê me derkeve holê.*"

Yek ji nav wan li ser yên din zîvirî û got: “*Lê ku gotina axê rast be?*” Yên din pê keniyan û henekê xwe pê kirin û gotin: “*Te heşê xwe wenda kiriye, ma axa dîn e, dinyak deynê wî li me ye. Qet axe bi qelemekî di vî deynî dibuhure, xwiyaye axê deftera ku lê deynên xwe nivîsiye wenda kiriye, bi vê riyê wê tê derxe bê ka çiqes deynê wî li me heye.*”

Mêrik dîsa dibêje: “*Ev axayê gambore qey derewan li me nake!*” Gundiyên din henekên xwe pê dikin. Mêrik di dilê xwe de dibêje: “*Ger gotina axê rast be, ez ê ji hemî deynên xwe xelas bim.*” Paşê jî dide rê û diçe mala xwe, bahsa îlana axê ji jina xwe re jî dike. Jina mêrik pirrî kêfxweş dibe. Li malê dibe kêf û şayî. Mêrik ji jina xwe re dibêje: “*Ka alî min bike em lîsta deynên axê yên li me derxin.*” Mêrik û jina xwe hete dereng, hete nîvê şevê rûdinin û deynên axê yên li wan dinivîsin. Di navekê re jina mêrik jê re dibêje: “*Binêre, tu dixwazî em hemî deynên xwe nenivîsin. Ger em hemî deynê xwe binivîsin wê deynê me pir xwiya bikin.*” Mêrik lê vedigerîne û dibêje: “*Nabe, axê di îlana xwe de gotiye ez ê li deynê kesên ku hemî deynên xwe binivîsin û bînin bibuhurim. Ji bo wê jî divê em hemî denên xwe binivîsîn.*”

Hete serê sibê dixebitin lîsta hemî deynên xwe derdixin. Gava roj hiltê, mêrik baz dide diçe ber deriyê axê da ku lîsteya destê xwe bidê. Li ber derî qerebalixiyeke mezin dibîne. Xwe li nav wan dixe û dighê ber derî. Dinêre derî vekiriye lê kesek nakeve hundir. Gundiyên din dibînin ku ew dixwaze bikeve

hundir û jê re dibêjin: "*Çi bûye, qey te hemî deynên xwe nivîsîne tu dixwazî bidî axê?*" Mêrik dibêje: ***"Erê min hemî deynên xwe nivîsîne û ez ê niha biçim bidim axê. Eve li vir li ser derî nivîsandiye; Her kî ku îro hete saet 12an deyên xwe binivîse û bîne, ez ê li deynên wan bibuhurim. Îmze axa. Ev axayê gambore ma dibe ku derewan bike?"***

Gundiyan destpêkir û keniyan. Mêrik li ser vê yekê got "*Ez dixwazim biceribînim*" û kete hundir. Gava mêrik di deriyê bexçê re ket hundir û ber bi deriyê xaniyê ku axe lê rûdinişt çû, hin gundî bi dûv ketin û gotin, "*Meçe, tu sersemî çi yî?*" hinekan jî digot ew sersem e û henekê xwe pê dikirin. Mêrik ji aliyekî ve digot ez ê ji deynê xwe xelas bim û kêfa wî dihat, ji aliyê din ve ji xwe re digot, lê ku xebera gundiyan be û ditirsiya.

Zilam gava tê ber derî, li derî dide û xulamê axê derî lê vedike. Jê re dibêje "*Ez dixwazim axê bibînim, min lîsta deynên xwe aniye*" Xulam mêrik dibe ba axê. Mêrik bi dilekî bitirs ji axê re dibje, "*Axayê min eve min lîsta hemî deynên xwe ji te re aniye.*" Axe jê dipirse û dibêje, "*Te he-mî deynên xwe nivîsî ne? Mêrik dibêje*" Erê min hemî nivîsî ne û lîsta deynan didê. Axe, ji mêrik re dibêje "*Temam ez ê li deynên te bibuhurim, lê divê tu hete saet 12an li benda min bî*" Gava mêrik vê yekê dibihîze bi carekê re çeng dibe ser piyan û dibêje "*Axayê min îznê bide, ez derkevim derve û ji yên li derve re jî bêjim da ku ew jî deynên xwe binivîsin û bînin. Bila ew jî ji deynên xwe xilas bin.*" Lê axe qebûl nake, dibêje "*Ev banga min ji bo herkesî ye. Wan jî wek te*

*îlan xwendiye. Hîn wextê wan heye. Ger hete saet 12an kî wek te hemî lîsta deynê xwe binivîse û bîne ez ê li deynê wî jî bibuhurim."*

Mêrik ji aliyekî li saeta xwe dinêre, ji aliyê din ve jî di dilê xwe de dua dike ku, yên li ber derî jî deynên xwe bînin û ji deynên xwe xelas bin. Li aliyê din yên li ber derî jî mereq dikin bê ka çi li hundir qewimî û biliya. Li hundir mêrik, li derve jî gundiyên din bi bêsebriyeke mezin li saetên xwe dinêrin. Di wê navê de saet dibe 9, 10, 11, 11:30, 11:45 û yên li ber derî ji bêsebrî nema tebat dikeve wan. Û gava saet tam dibe 12, axe li hundir bi kaxeta ku lîsteya deynên mêrik lê nivîsandiye digre diçirîne û dişewitîne. Ji mêrik re jî dibêje "*Tu niha dikarî biçî."*

Mêrik bikêf ber bi derve de bazdide û diqîre, dibêje *"Ez xelas bûm, xelas bûm, axa li hemî deynên min buhurî û dema mêrik wusa dibêje xulamê axê kaxeza li ser derî dadixe û derî digire. Hemî gundî zorê didin derî û li derî dixin. Li ber axê digerin, dibêjin;"* Ji bo Xwedê derî vekin em jî dixwazin ku axa li deynê me bibuhure. Axa li me bibuhure! Me kir tu meke! Li ser vê axa derdikeve ber derî û dibje, "*Ev pêşniyarî hete saet 12an bû. Niha jî dem tije bû."*

Erê xwendevanên delal, ev çîroka ku min li jorê bahs kir ez texmîn dikim niha hûn jî li ser fikirî ne.

Belbî hûn heye niha fikirî ne an jî ne fikirî ne. Belbî we bangeke weke vê bihîstiye an nebihîstiye, ka em niha dilê xwe

vekin û bifikirin. Hete îro me çi kir û niha em çi dikin? Berî niha bi 2000 salî Mesîh Îsa ji bo guneh û barê mirov î hilgire, li çarmîxê canê xwe da. Û ew li hêviya wan kesan e ku baweriya xwe pê bînin û wî wek Rizgarker û Xweda bistînin jiyana xwe. Tenê tiştê ku divê em bikin, divê em dilê xwe vekin, hemî guneh û barên xwe bidin Wî û Wî wek Rizgarker û Xweda qebûl bikin . Ji ber ku Mesîh Îsa wusa dibêje: "Eve ez li ber derî rawestiya me û li derî dixim. Kî ku dengê min bibihîze û derî veke, ez ê bêm ba wî..."

Belbî hûn niha difikirin û dibêjin; gelo tistên hatine nivîsîn rast in, an gotinên vala ne? Ger ez qebûl bikim an nekim wê çi biguhere an jî ferq bike. Ez dixwazim dîsa pirtûkê bi çîrokekê xelas bikim û we bi vê banga ku ji we re hatiye kirin re bitenê bihêlim.

Rojeke havînî kelakela tavê bû. Mêrik li mala xwe ji germa bêzar bûbû. Fikirî. Ji xwe re got, "Ez dikarim biçim sahîlê, ji xwe re hinekî bigerim. Belbî bi vî awayî hinekî hînik bibim." Çû ber perê deryayê, li ber keviyên deryayê meşiya.

Li bin tava germ deryayê hete tu bixwazî pêl dida. Her pêleke ku li sahîlê dixist masîstêrk bi xwe re li reşayiyê bela dikirin. Mêrikê ku dibîne masîstêrkên li resayiyê belav dibin ji bêavî hişk dibin, her lêw hêr dimeşe.

Pistî ku hinekî din diçe, dinêre ku yek masîstêrkên li reşayiyê digre dîsa tavêje nav deryayê. Şaş dibe û diçe balê jê dipirse: "Tu çi dikî?" Yê din lê vedigerîne: "Ez masîsitêrkên ku bi pêlan re hatine li reşayiyê mane, ji bo ku ji german nemirin digrim û

dîsa tavêm nav deryayê." Mêrik dikene û masîsitêrkên li reşayiyê nîşan dide û dipirse: "Tu dikarî çendan ji wan xelas bikî?"

Yê din ji erdê radihêje masîstêrkeke din û wê tavêje deryayê û dibêje: "Ji bo vê pir tişt hatin guhertin û dikare ji nû ve bijî."

Xwendevanê delal, piştî ku te ev çîrok xwend û pêve ji bo te jî gellek tist guherîn.

## *Ez Ji Bo Te Dimrim*

Berî niha bi salan li welatekî ji welatên rojhilat, du birayên hev ên ku qerekterê wan bi tevayî ji hev cihê, hebûne.

Yê biçûk, ji serê sibê zû hete nîvê şevê araqê vedixwe, her cûre gunehî dike; qet ne li ser bala wî ye jî, ku dev ji van gunehan berde. Bi kurtayî jiyaneke xirab, ketî û belengaz dijî.

Birayê mezin jî, berevajiya yê biçûk ji Xwedayê xwe ditirse, nefsbiçûk û xêrxwaz e, ji bo jiyaneke pîroz bijî xwe bi baweriyeke rasteqîn û bêwestan sipartiye Xwedayê xwe û merivekî ji gunehên dinyayê dûr e.

Ew, ji ber vê jiyana birayê xwe ya hejar xemgîn dibe, hêstiran bi ser de dibarîne, li ber digere û dixwaze ku ew dev ji vê xwiya xwe ya xerab berde. Birayê wî guh nade vê li bergeriyana wî û peyvên kekê wî di guhekî re dikevin û di yê din re derdikevin; berevajiya wê, hîn bêtir li gunehên ku dike

degel dibe û xwe helak dike. Çibigre her roj vê jiyana xwe hete nîvê şevê dijî û henekê xwe bi kekê xwe yê ku ji bo wî ji dil û can li ber Xwedê digere, dike.

Dîsa gava kekê wî li malê bitenê li benda wî ye da ku vegere malê, dinêre ku hinek ji hinc û hêl li derî dixin. Mêrik wê gavê baz dide diçe derî vedike. Bi vekirina derî re birayê wî dikeve hudir.

Birayê wî, ji tirsan reng lê nemaye, kincên wî di xwînê de mane û diricife...

Ji kekê xwe re dibêje: "*Min xelas ke! Min veşêre! Li pey min in, min mêrek kuşt. Li xwînê binêre, ev xwîna wî ye!*"

Kekê wî difikire, dibêje ez wî çawa veşêrim ku kesek bi ser wî venebe. Ji birayê xwe pirr hez dike. Bêyî ku zêde li ser bifikire kekê wî, kincên bixwîn ên birayê xwe jê dike û li xwe dike.

Kincên xwe lê dike û wî dixe odeyekê û derî li ser digre. Demekê bi şûn de polîs dikevin hundir.

Di nav xwe de dibêjin "*Temam ev mal e, wek me texmîn dikir*" polîsên ku bi hev re dipeyivin ber bi birayê mezin ve diçin. Bi awirên tûj li serçavên wî û kincên wî dinêrin. Yek ji wan dipirse:

"*Qatil tu yî?*"

Ew bersiva wan nade. Polîsê bêsebir li hevalê xwe vedigerîne dibêje:

*"Tu çima dipirs î? Tu nabînî? Kincên wî di xwînê de mane! Were, em wî girêdin û bibin."*

Paşê destên wî girêdidin, wî di riyên tarî re dibin ciyekî dûr. Di hefsê de wî dixin hucrê. Gava ku dibe sibe ji bo lêpirsîna wî dîsa polîs tên. Ew bitenê vê dibêje.

*"Ez dizanim ku ez ê ji ber vî sûcî bêm îdam kirin. Hûn çiqesî zû hukum bicîh bînin ji bo min wê ewende baş be."*

Piştî bi çend rojan wî dibin seraya edliyê û derdixin hember dadger. Dadger li kincên wî yên bi dexme dinêre, dibêje: *"Ji vê yekê re şahid navê, her tişt eşkere xwiya ye."* Dadger ji meznûn dipirse, dibêje: *"Parêzerê te heye?*

Meznûn dibêje, "*Na.*"

Dadger ji nû ve jê dipirse û dibêje, *"Tu naxwazî xwe biparêzî?"*

Meznûn bi dengekî bilind û ji xwe bawer bersiva wî dide û dibje, "*Na ez naxwazim.*" Paşê jî ji bo ku tê dernexin ku tu sûcekî wî tuneye serê xwe bera ber xwe dide.

Piştî darizandinê, cezayê mirinê didinê. Mahkûm bi bêdengî li benda roja mirina xwe ye. Êvara roja bicihanîna cezayê wî, bêyî ku kesekî jê hêvî bikira mahkûm dixwaze bipeyive. Rica dike, dixwaze ku birêvebirê zindanê bê hete ba wî.

Gava ku birêvebir dikeve hucra wî, mahkûm dibêje: "*Tu naxwazî rica dawîn a miroveki mirina wî nêzîk bicîh bînî, tu dixwazî qenciyekê bikî? Tika ye ji min re kaxez, qelem*

*û hibrê bînin. Ez ê nameyekê binivîsim, devê wê bigrim û mohr bikim. Hûn li huzûra Xwedê soz didin ku hûn ê wê venekin û piştî mirina min teslîmî navnîşana li ser bikin? Bawer bikin tu eleqa vê daxwaza min bi niyeteke xirab tuneye."*

Birêvebir biserinc li çavên mahkûm dinêre, ji peyvên wî nakeve şikê û dilê wî daxwazên yê hemberî wî red nake. Tu dibê qey mahkûm canê xwe di ber vê ricayê de daye. Ewende bêdeng û sakîn e ku, çavên wî wek nûra Xwedê dibirûsin.

Birêvebir nameya wî tîne bi destê xwe teslîm dike û jê re dibêje ez ê daxwaza te bicîh bînim, bila dilê te rihet be.

Êvarî, gardiyan tê ber hucreya mahkûmê ku biryara îdama wî hatiye dayin, bêdeng û his radihêje nameya ku wînivîsîye.

Şevek dibuhure; şeveke welê ku, ji bo hinekan sakîn, ji bo hinekan bikeder, ji bo gelekan bi guneh, ji bo mahkûm jî şeveke bêxew e. Lê şeveke bihuzûr ew, weke li ber deriyê herheyîtiyê li dinyayeke din temaşe bike, çong daye. Serê sibê rojeke nû hiltê. Mirov, weke her gav dîsa diçin ser kar û barên xwe. Yên ku wê ew bibirana îdamê jî. Saetek bitenê di wê navê de derbas dibe û her tişt xelas dibe...

Di pey re demeke kurt derbas dibe. Nameyê bi karmendekî re rêdikin mala herdu biran. Mirovekî ciwan ê biheyecan ku ji tirsan reng lê nemaye derî vedike û nameyê digre. Wek name şaş hatibe bi awireke matmayî dûr û dirêj lê dinêre. Di encamê de nameya mohr kirî vedike û dixwîne...

Bikeder dinale; bibez diçe ber derî, dîsa tê odê, weke yekî seweşî diçe û tê. Ricfek bi hemî canê wî digre û bi dengekî bilind dike hawar. Tiştê ku di nameyê de hatiye nivîsîn çi ye? Ne pir e, bitenê çend peyv in: "*Sibê ez ê bi kincên te, ji bo te bimrim. Tu bi kincên min, min bi bîra xwe bîne, jiyaneke rast û pîroz bijî*" ***"Ez ji bo te dimrim!"***

Ev peyv ji dil û can wî xemgîn dikin. Dilê wî yê ku bi tirs û gunehan bûbû weke kevir, te digot qey ji nû ve ruh pêve hatiye. Hevoka ku kekê wî nivîsî bû bi dengekî bilind dubare dike. "***Ez ji bo te dimrim.***" belbî hîn jî nemiriye... Ji bo kekê xwe xelas bike, bibez ji malê derdikeve. Bibazdan diçe xwe li deriyê zindanê diqelibîne. Li wir wî didin rawestandin. Bi rik dibêje ku ew dixwaze birêvebirî bibîne. Karmendên ku ji ber lavakirina wî dimînin heyirî, wî dibin ba birêvebir.

Gava ku hevoka "***Ez ji bo te dimrim!***" dixwîne, bitirs vedicinîqe, rica yê mirî awirên wî yên jixwe bawer û aram tên bîra birêvebir. Demeke dirêj di ciyê xwe de dişeqize, nikare rabe. Paşê bi heyecaneke mezin nameyê dibe dide destê dadger. Dadger jî nameyê dixwîne û dest pêdike îfada tawanbarê esil digre. Ew jî, jiyana xwe.ya borî, cînayeta ku kiriye, rewşa xwe û bêdengmayina xwe ya bêrûmet hemiyî rave dike:

Bi peyvên "Min bikujin! Ez ricayê ji we dikim. Bihêlin bila ez bimrim!" axavtina xwe bidawî tîne.

Lê peyva yê mirî ku gotibû, "***Ez ji bo te dimrim!***" li ser dadger jî tesîra peyveke pîroz dike. Cangoriyekî wusa mezin, beleheq nabe. Dadger êdî bi sempatiyeke mezin li birayê wî

dinêre. Bi hezkirineke çendî mezin jê hatiye hezkirin! Hefskirin û îdamkirina wî ji Xwedê heqrewa nabîne. Ji ber ku kekê wî di ber gunehên wî de canê xwe daye. Birayê biçûk, nameya wî di destê wî de efûkirî vedigere mala xwe.

Şîna wî riya ku divê êdî tobe bike nîşanî wî dide. Bi dilekî korîpoşman li Xwedayê xwe vedigere û li ber digere. Bi heraret û bigirî ji xwedayê xwe lava dike:

***"Ya Reb! Min bigunehê min nekuje! Yekî din ji bo gunehên min mir. Ji bo ku ez li hember gunehan rawestim sebr û qewetê bide min. Min bike layiqê yê ku ji bo min, kincên min li xwe kir. Ji bo ku ez wan ji her cûre lekeyan biparêzim alîkariya min bike û min ji her gunehî biparêze."***

Ji wê rojê û vir de, ew, ewende diguhere ku hevalên wî nema karin wî nas bikin. Tevî ku sempatîk û dilşa ye, ew weke ku di nav wan de kesekî biyanî ye êdî.

Di destpêkê de her çend hevalên wî jê bixwazin ku ew dîsa vegere jiyana xwe ya berê jî ew, bi zarekî şêrîn vê bersivê dide herkesî: ***"Ez bi van kincan nayêm; ji ber ku kekê min ne diçû ciyên welê."***

Hevalên wî hêdî hêdî dibînin ku hemî hewldanên wan belasebeb in, wê gavê dev jê berdidin, wî nema aciz dikin. Hin ji wan bitevayî terka wî dikin. Hinek jî bi şemîmiyet, bi hurmet li kincên ku wî li xwe kirine dinêrin. Bêyî ku qîma xwe binêrîna li jiyana wî ya bêguneh binêrin bînin, ew jî beşdarî vê jiyana wî ya pak û paqij dibin.

Ji vir bi şûn de jiyana wî hemî bi kar û xebatê derbas dibe û xîreta wî ya li ber Xwedê pirr berheman dide.

Paşê Xwedê, peyvên wî yên li ber Xwedê-Yezdan-Dadger, ku berê bêşik ji dil gotibûn, wê gavê bihîstibûn. Ji bo ku bi awayekî herheyî her dayîm bi hev re bimînin dema yekbûna wan hatibû. Gava ku birayê biçûk dimire, li ser daxwaza wî kincên kekê wî tavêjin ser termê wî û wî dibin dixin gorê. Nasên ku bi mana kûr a vê yekê dihesin, vê bûyerê tu carî jibîr nakin.

Xwendevanên delal, çîroka me li vir bidawî tê. Nabe ku mirov li hemberî hezkirina herheyî ya kekê li hember birayê xwe heyran û hişmetkar nemîne. Ji ber ku mirov hezkirineke wusa pir kêm dibîne, me çîrok biserinc û meraq hete dawî xwend. Em dikarin yek- du çîrokên din ên wek ya me ji edebiyata cîhanê bixwînin. Mirov dikare rastî çend kesên ku ji bo birayekî an ji bo dostekî pirr girîng bimêranî mirine bê. Lê ez dixwazim bala we bikşînim ser bûyereke ku ji van hemiyan bêtir me eleqedar dike:

Îsa ne ji bo birayekî an ji bo dostekî, di ber gunehkaran û dijminên xwe de canê xwe feda kir. Em belbî ji bo mirovekî çê an di ber dawayeke pîroz de dikarin amadebin ku canê xwe feda bikin. Lê Îsa, jiyana xwe di ber kesên nankor, mexrûr, derewîn, egoîst, çikûs, xapînok, tiral, hesûd, xayin, şerûd, bêbext, zinêkar, xeberok, kîndar de feda kir. Îsa weha gotiye.

*"Ne kesên saxlem, belê kesên nexweş hewcedari hekim in."* (Incîl, Luka 5:31)

Adem û Hewa ji ber ku carekê îtaet nekiribûn ji bexçeyê Aden hatin bidûrxistin û jiyana ebedî ji destê wan çû. Lê me li hemberî Xwedê ne carekê, gelek caran îtaet nekiriye û belbî hîn jî em nakin. Barê me gellekî giran e. Û bi hêza xwe, bi xîreta xwe hergîz em ê nikaribin cezayê gunehên xwe bikşînin.

Rewşa me gellekî dişibe ya birayê biçûk ê di çîrokê de: Divê em ji edaletê, ji hukum û mirina ebedî bitirsin. Divê kesek hêvî neke ku wê Xwedê çavê xwe ji gunehê me re bigire! Kesek nikare tiştekî ji Xwedê veşêre. Ji bo Xwedê tiştekî tarî jî tuneye. Lê Xwedê bêçarebûna me dizanibû, ji ber vê Mesîh Îsa ji me re weke xelasker tayin kir. Wî, tevî ku bêguneh bû jî barê gunehên me girte ser milên xwe, kefareta gunehên me da. Bi êş û azarên nedîtî canê xwe da. Bêyî ku cudatiya dînî, zimanî, nijadî bike, canê xwe kir goriya hemî mirovan. Ji bo me mir.

Gava ku dadger, hezkirina birayê mezin dît, jiyana wî di ber ya birayê wî de hesiband. Birayê wî efû kir û serbest berda. Xwedê jî wê ji vî dadgerê dinyayî bi şûn de nemîne û jê hîn jî pêşdetir e: Ji bo tu kesekî ku Mesîh Îsa wek Reb û rizgarker bihesibîne ceza tuneye. Xwedê mirina Mesîh Îsa ya li şûna hemî mirovayetiyê qebûl û tezdîq kiriye. Bi ji nû ve vejîna Îsa ya piştî mirina wî bi sê rojan jî nîşanî me da ku her tiştê wî kiriye diecibîne.

Mixabin pirraniya mirovan, kesên bi nav xiristiyan jî tê de nikarin qîmeta hezkirin û mirina Mesîh Îsa teqdîr bikin. Hete dibêjin, *"Ma dibe ku mirovek cezayê mirovê din bikşîne,*

*yek li şûna yê din bimre?"* henekê xwe bi kesên ku baweriya xwe bi vê riyê anîne û li ser sopa Mesîh Îsa ne dikin û wan kêm dibînin.

Xweziya mirovên wusa, pîroziya kincê birayê mezin fêm bikira. Mesîh îsa li vê dinyayê jiyaneke pir û pak, bêdexme û hîle jiya. Her peyv û tevgera wî ji rastî û hezkirinê bar bû. Pêşwaziya dijminên xwe jî bi lutfê kir. Îsa, kincên me yên gemarî û guneh li xwe kir, kincên xwe yên ku demeyeke biçûk jî li wan tunebûn emanetî me kirin. Yên ku ev kinc li xwe kirin, berpirsiyariyeke mezin û pîroz girtin ser xwe. Ji ber hezkirina wan a li hemberî Rizgarker, xwestin bi tevayî bibin wek Wî, wek Wî bipeyivin û tevbigerin, wek Wî hez bikin. Hezkirina Reb ji zanîn, mal, şan, xizm û ji hemî tistên biqîmet ên vê dinyayê girîngtir dîtin.

Mirovên wusa ji bo vê jiyana nû ji ku qewetê distînin. Mesîh Îsa, wek we di çîrokê de jî xwend bitenê ji me re kincên xwe yên paqij hiştine. Xwedê, Îsa piştî mirina wî bi sê rojan vejand. Mesîh Îsa ruhê xwe yê jiyanê û hemî dewlemendiya jiyanê ya li ba xwe (hezkirin, rastî, qencî û pîroziyê) dide kesên ku weke rizgarker baweriya xwe pê anîne. Ji niha ve jiyana wan a ebedî heye. Ango bi ruhê xwe dijîn. Her çend zor û zehmetiyên jiyana kesên ku ji nêzîk ve dane ser şopa Îsa kêm nebin jî, dîsa wê Mesîh Îsayê ku li hemberî mirinê biserketiye, hete taliya rê ji wan re rêberiyê bike û bi wan re be.

Îsa weha gotiye: "*Di deriyê teng re bikevinê. Deriyê ku we bibe mirinê fireh e, riya wî jî biber e. Kesên ku tê re*

*dikevinê pirr in. Lê deriyê ku mirov dibe jiyanê teng û riya wî jî teng û tahl e û kesên ku bi ser ve dibin pirr kêm in."*

## *Ez Ji Mirinê Rizgar Bûm*

Sînan, xwediyê hemî nav û nîşanên li rû dinyê bû. Ciwanî, dewlemendî, bedewî, kesayetiyeke sempatîk... Van taybetmendiyên wî wer lê kiribûn ku herkes jê hez bike û lê bigere.

Malbata wî, ji biçûkantiya wî de han da ku wî bi qencî û pakiyên baweriya Mesîhî perwerde bike. Di duayên xwe de, ji Reb niyaz kirin ku wî ji dahf û kemînên vê dinyayê biparêze. Lê her ku temenî wî mezin bû, jiyana serbixwe ya ku ciwanên din dijiyan, pê ji ya wî ya muhafezekar û aram xweştir hat. Hêdî hêdî ji bin tesîra malbata xwe derket.

Ji bo ji xwe re dostên zewq û kêfê yên ku wê ji xeynî xirabî û bedbextiyê pê ve nikaribin wî bighînin ciyekî din bibîne zehmetî nekişand. Di rewşên wusa de kewên xam xwe zû li

dahfan diqelibînin. Lê yê wî dayikeke wî ya ku jê re her tim dua dikirin hebû û Reb bûyera ku ez ê niha ravekim weke cewaba di riya van duayan re ji bo wî bikaranî.

Sînan, ji bo çend rojan li mala hevalê xwe derbasbike çûbû Sêwasê. Bavê hevalê wî jî şefê dewlemend û yextiyar ê banka ku lê dixebitî bû...

Hevalê wî li halê wî dipirse: *"Tu çawa yî baş î Sînan, jiyana te çawa derbas dibe?"*

Sînan jî dibêje, "*Ez jiyaneke pirr xweş derbas dikim. Dawet, xwarin, seyran, kêf û şayî... Di wê navê de bitenê ez dibînim ku çawa wext weke avê derbas dibe.*"

Gava sînan dipeyive, hevalê wî bi hezkirin û liberketin lê dinêre, difikire û li ber dikeve ku çawa ev xortê hêja û bedew hîn nizane ku zewq û kêf katî ye û wê dawiya wî bi çi be. Pistî ku demeke din jî godariya wî kir, hevalê wî got:

*"Ez dibînim ku tu wexta xwe bi kêf û şayî derbas dikî. Ev tiştên ku tu ravedikî peyvên zanayekî zemanên berê anîn bîra min: 'Ho peyayê ciwan, di ciwaniya xwe de bikêf û eşq be, di rojên ciwaniya te de bila dilê te kêfa te bîne. Li ser riya dilê xwe û tiştên ku çavên te dibînin bimeşe.*" (Waz 11:9).

Xwiya ye ev peyv gellekî bi Sînan xweş tên. Di dilê xwe de dibêje, *"Tiştê ku ez jî lê digerim jixwe ev e!"* Lê hevalê wî her peyvek kirpand û gotina xwe domand:

*"Lê divê tu zanibî ku, ev tişt hemî wê te ji bo Xwedê bibin ber hukum. Ji bo wê jî kederê ji dilê xwe bavêje, xirabiyê ji bedena xwe dûr bixe, ji ber ku ev dem dema tezetî û egîtiyên vala ye."* (Waz 11:9,10).

Sînan peyvên weha nedipa. Wek bixwaze ji peyvên ku dihatin guhê wî bireve, ji mala hevalê xwe derket. Lê tîrê ku ji destê Xwedê derketibû carekê li dilê Sînan dabû, êdî nikaribû xwe jê xelas bike.

Gava ku vegeriya malê jî her çend diberxwe da jî nikaribû xwe ji tesîra peyvên ku bihîstibûn xilas bike. Gava ku dostên wî yên ku wê bîsteke din ew bidîtana hatin bîra wî, dilê wî hinekî din xemgîn bû. Di jiyana bihereket a kêf û şayiyê ya ku dîsa vegeriyabûyê de ew kêf û eşqa berê nedît.

Êdî tu tameke tiştên berê ku zewq jê distend, nemabû. Peyvên ku ji hevalên xwe bihîstibûn her gav di guhê wî de deng vedidan. Li seydê, li dansê, li dawetan yekî ku wî ew nedidît tim jê re digot, *"Bizanibe ku, ev tişt hemî wê te bibin ber hukum."*

Tu dixwazî bila di xew de bûna, an şiyar bûna, ev peyv wek bi herfên ji êgir hatibin nivîsandin, didîtin. Ruhê Xwedê êdî di kesayetiya wî de her likar bû. Daxwaza Xwedê wê ev kiryar temam bikira.

Zewqên ku dixwest tam bike êşa ruhê Sînan a ku dikşand sivik nekir. Berevajiya wê, her ku diçû ev şayiyên bi nav şayî ji bo wî bûn îşkence û êşên ku nema karibû ji ber wan di ber xwe bide. Diviya çi bikira?

Wî ji xwe re got, *"Ez ê biçim Sêwasê. Divê ez Ekrem bibînim. Wî bêmanebûn û valabûna van şayiyan nîşanî min da."* Bi biryareke welê tavilê kete rê û çû ba hevalê xwe. Ji Ekremê ku bi eşq pêşwaziya wî kiribû re got:

-*"Ji cara dawîn a ku min tu dît û vir de ez gellekî bêhêvî me. Berê di derheqê pêşerojê de ez qet nefikirî bûm. Ez li pey zewqên katî bûm, min digot qey jiyana min pak û bêguneh e. Lê niha ez dibînim ku ev tişt hemî ji bo ku ez Xwedê jibîr bikim, di xizmeta egoîstiya xwe de bim û wexta xwe vala derbas bikim pê ve bi kêrî tiştekî din nayên. Aliyê herî xirab ê vê jiyana bêmane, eynî wek tu çavê xwe girêdî û rastiyên herheyî û darizandina dahatî nebînî ye... Divê ez çi bikim? Ev herheyîtiya li hember min tu dibê qey bi perdeyeke qalîn hatiye nuxumandin. Ez his dikim ku darizandineke zor li pêşiya min e... Dosto, çi dibe bêje, ez dikarim çawa ji vê yekê xelas bibim?"*

Hevalê Sînan ê ku di bin tesîra bêçarebûna wî de mabû, wê gavê radihêle pirtûka xwe ya pîroz û jê re ji peyva Xwedê ya jîndar şirov dike ku, çawa Mesîh li çarmîxê ciyê gunehkaran girtiye, barê darizandina xwe û me hemiyan girtiye ser milên xwe û li şûna me çawa miriye.

Piştî bêdengiyeke katî jê re ji pirtûka pîroz ev ayetên girîng xwendin:

*"Xwedê heskirina xwe ya ji me bi vê îspat dike: Hê em gunehkar bûn Mesîh ji bo me mir."* (Nama Romayiyan 5:8).

*"Ji ber ku Mesîh jî ji bo ku me bighîne Xwedê li hember gunehan carekê mir."* (I.Petrus 3:18).

*"Îcar Xwedê wek ku bi saya me rica dike, em li ser navê Mesîh şadetiyê dikin. Em bi navê Mesîh lava dikin: Bi Xwedê re li hev werin. Xwedê, yê ku bi guneh nizanibû ji bo me kir guneh, da ku em di şexsê Mesîh de bibin rastîparêziya Xwedê."* (Nama Korintosiyan II. 5:20).

" *Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim: Her kesê ku guhê xwe bide gotinên min û bi yê ku ez şandime baweriyê bîne, jiyana wî ya herheyî heye; ew nayê hukumkirin, lê ew ji mirinê gihiştiye jiyanê."* (Yuhanna 5:24).

*"Her dibêjin ku em li benda Kurê Wî ne. Xwedayê ku Îsa ji nav miriyan vejand, wê me ji darizandina bixezeb jî rizgar bike."* (Incîl, Selanîkiyên I. 1:10).

Sînan baweriya xwe bi peyva Xwedê anî. Wî dizanibû ku ji hukmê darizandin û xezeba wî pê ve ne layiqê tu tiştî ye. Lê wî di eynî wextê de baweriya xwe bi Pirtûkê jî anî. Îsa ji bo wî jî tehemula ezabê mirin û darizandinê kiribû, bi vî awayî edaleta Îlahî hatibû cîh. Êdî Sînan jî didikaribû tama rizgarî û bexişandina ku Mesîh ji bo wî jî bidestxistibû, derxista.

Bi rastî jî gava ku baweriya xwe bi Xwedayê xwe anîbû, dilê wî bi eşq û huzûr tije bûbû. Ji vir û wê ve, wê li rûdinyê bêtirs û bihesret li hêviya jiyana herheyî bûna. Lê ev di eynî wextê de jî riyeke wusa dijwar bû ku wê hergav pêdiviya wî bi alîkariya Xwedê hebûna.

Di destpêkê de ev guherankariyên di jiyana xwe de ji hevalên xwe re negot. Ji ber ku şêytên dixwest ku ew vê yekê veşêre:

*"Çawa bibe niha ew rihet bû; nepêdivî bû ku fikrên xwe ji wan re bigota."*

Demekê tecrûbeyên xwe, tistên ku bi serê wî de hatibûn ji hevalên xwe veşart. Lê dilê wî ne rihet bû, nebextewer bû. Dizanibû ku meriv baweriya xwe ji însanan veşêre ne tiştekî baş e. Gava ku însanên li dora mirov hewceyî ronahî û zanînê bin, mirov ji Încîla Mesîh şerm bike ne karê aqilan e.

Rojekê ji rojan piştî civîneke dînî gava bi Pirtûka Pîroz a di destê xwe de vegeriya Hotêla ku lê dima, çavê wî bi hevalên wî yên ku li şanişînê rûniştibûn ket. Şeytên di guhê wî de kir kurepist û got *"Niha ew henekê xwe bi te dikin; him gava mirov Pirtûka Pîroz di dest de bigere, ev ji xeynî quretiya li hemberî mirovayetiyê pêve ne tistekî din e wê têxe berîka xwe!"*

Bi vî awayî kete xefika ku dijminê rastiyê li ber wî veda bû. Bi lez di pêlikên hotêlê re derket û çû jor. Pirtûka Pîroz bi lez û bez xistibû berîka xwe. Lê dîsa jî, ji ber ku kincên lê hinekî teng bûn, berîka wî ya werimî bala mirov dikşand.

Hevalekî wî xwe negirt, pirsî û got, "*Ew çi ye di berîka te de Sînan?"* Wek yekî ji xefle de hatibe girtin, wê gavê Pirtûka Pîroz a di berîka xwe de derxist û li ber çavê herkesî îtîraf kir û got ku wî êdî jiyana xwe teslîmî Rebê xwe kiriye, ji vir û wê ve, wê bitenê xizmeta Mesîh bike.

Bi saya vê îtîrafa eşkere hinekî bîhna wî hate ber, rihet bû, ji ber ku wî îtaet ji peyva Xwedê re kiribû: *"Û ez ji were dibêjim: Kî ku min li ber mirovan eşêker qebûl bike, Kurê Mirov jî wê wî li ber milyaketên Xwedê eşkere bike; lê*

*belê kî ku min li ber mirovan înkar bike, ewê li ber milyaketên Xwedê were înkarkirin.*" (Luka 12:8,9).

Sînan dîsa bextewer bûbû. Lê ev bexteweri, bi tenê nîşana êrîsên bêjimar ên civat û dinyayê yên li dijî wî bû. Marûzbûna êrîşên weha ya kesên xwedî bawerî ne tistekî seyr e, berevajiya wê, gava ku marûz nebin seyr e.

Ji wê çaxê û vir de Sînan feqîr, zengîn ji herkesî re bahsa Îsa û hezkirina Wî kir, mizgîniya Incîlê da. Vê yekê him ew bextewertir dikir him jî li hember êrîs û heqaretan bihêztir dikir. Kesên li dijî Mesîh êrîşên xwe pirtir kirin, ewende ku, hinan ji wan xwest wî bikujin jî.

Êvarekê nameyek kete destê wî. Kesên ku name jê re rêkiribûn dixwestin wî bibin ciyekî xalî. Ev qomployek bû ku, ji bo wî ji malê bidûr xin. Gava ku bi trambela xwe çû ciyê ku wê lê hevdu bibînin, bi demançê bera wî dan. Gulle bera sînga wî, aliyê dilê wî dabûn. Gullê kincên wî qelastibûn, derbas kiribûn. Dijminên wî gotin qey miriye, belê gulle di Pirtûka Pîroz a di berîka hundur a kincên wî de mabû û ew ji mirinê xelas kiribû.

Sînan ji kesên ku ji bo seredanê dihatin mala xwe re, ev xatiraya nesuruştî ya ku nîşana şewqet û eleqeya bavê wî yê li Ezmanan bû nîsan dida. Gullê bergê Pirtûka Pîroz û piraniya rûpelên wê qul kiribû, derbas bûbû, di beşê Yuhanna yê Incîlê de, di ayeteke duaya Mesîh a ji bo şagirtên wî de, bêyî ku zerarê bidiyê mabû: "*Ya Bavê Piroz! Bi navê xwe yê ku te da min wan biparêze!*" (Yuhanna 17:11).

Xwendevanê delal, tu dizanî jibîrnekirina vê ayeta ku ew tirs û sawa di dilê vî xortî de bi carekê re ji navê rakir çendî girîng e. Li ser vê ayetê bifikire, ji bo Ruhê Reb, bi alîkariya vê ayetê di te jî bigere dua bike.

Ger ku carinan bîhna te teng bibe, tu bixwazî biqîrî û bêjî *"Divê ez çi bikim?"* jibîr meke ku di Pirtûka Pîroz de ev ayet jî hatiye nivîsandin: *"Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim: Her kesê ku guhê xwe bide gotinên min û bi yê ku ez şandime baweriyê bîne, jiyana wî ya herheyî heye; ew nayê hukumkirin, lê ew ji mirinê gihiştiye jiyanê."* (Încîl, Yuhanna 5:24).

## *Rizgarker Kî Ye?*

Ewende rê li ber min hene ku, ez nizanim ez ê kîjanê bibijêrim, bi kîjanê de herim nizanim. Lê tiştê ez dizanim jî ew e ku, divê ez rûnêm, kumê xwe dînim ber xwe û bikitekit baş bifikirim. Ji ber ku li pêşberî min riyeke jiyanê ya ku divê ez temam bikim, heye. Gava ku ez li ser vê riyê bimeşim jî ez naxwazim bişewişim, bikevim û rabim.

Tistê ku divê ez bikim, dikim û rûdinêm difikirim: Bar li ser mil û pista min hene. Bi van baran li meydana ku jê re dinya dibêjin digerim. Li vê meydana ku ez lê digerim ji mirovên pêşîn Hewa û Adem bigre ez hemî mirovên hatine û çûne dibînim. Pêxember, mirovên oldar, zana û feylesofan dibînim. Bi kurtayî hete dewra min, ji mirovê pêşîn bigre hete roja îro hemî mirovan û ev mirov jî weke min li ser mil û pişta wan barê wan derbas dibin û diçin. Hemî mirovên li vê meydanê wek min di himêz û li ser milên wan jî bar hene.

Ez jî wek mirovên din dimeşim. Her ku diçim barê li ser milê min û yê di himêza min de giran dibe. Bar ewinde giran dibin ku, êdî ez nema karim wan hilgirim. Ji bo alîkariya min bikin ez gaziya xwe dibim mirovên li derdora xwe. Ez dikim hewar û dibêjim: "*Çi dibe, alîkariya min bikin! Alî min bikin! Êdî ez nikarim barên xwe hilgirim! Çi dibe hinek barên*

*min jî hûn hilgirin da ku ez karibim hinekî din jî bimeşim"* Lê mirovên ku ez li dora xwe dibînim hemî ji mirovê pêşîn Adem bigre hete yên roja me weke min di himêza wan de û li ser milên wan bar hene.

Piraniya mirovan wek min ji ber barê xwe dikin gazî û hawar. Tevî ku ez rewşa wan jî dibînim ez dîsa jî li alîkariyê digerim. Ji ber ku êdî ez di bin giraniya barên xwe de dimirim. Ez li ser hawar û gaziya xwe berdewam im.

Yekî ku guh dabû gazî û hewara min ber bi min ve tê û dibêje, *"Binêre ger tu bixwazî ez karim alîkariya te bikim."* Bi kêf ez li vî mirovê ku van peyvan ji min re dibêje dinêrim, lê di hêmêza wî de û li ser- milên wî jî wek yê min bar hene. Ji min re dibêje, *"Ger tu bixwazî û li pey min bêyî ez dikarim alîkariya te bikim. Ez nikarim barên te hilgirim. Ji ber ku tu dibînî barên min jî hene. Lê ku tu bidî pey min û li ser şopa min bêyî, ez ê alîkariya te bikim, bê tê çawa hete dawiya vê riyê biçî."*

Ez dibêjim, *"Tê çawa alîkariya min bikî? Taqeta min a ku ez gaveke din bavêjim jî nema."* Ew ji min re dibêje, *"Ger tiştên ku ez dibêjim û pêdiviyên dînê min tu bicîh bînî, hete dawiya vê riyê tu li pey min bêyî, em ê karibin di dawiya vê riyê de bi hev re rizgar bibin."* Li ser van peyvan ez dibêjim, *"Hêza min û ez gavekê bavêjim nemaye ku, ez karibim pêdiviyên te û yên riya te bicîh bînim, tu yê hinekî ji barê min hildî û min rihet bikî? Tu ji min re bibêje."* Ji min re dibêje, *"Ez nikarim barê te hilgirim. Ez tenê karim barên xwe hilgirim. Wek tu jî dibînî barê min*

*jî wek yê te heye. Lê ger tu bidî ser riya min wek min got di dawiya vê riyê de em ê karibin bi hev re ji barên xwe xelas bin."*

Min dizanibû dê fêda vî mirovî li min nebe. Ne hewce bû min xwe biwestandana û li ber bigeriyama. Ji ber ku ne mumkun bû ku rahişta piçekî ji barê min. Ji ber ku barê wî jî wek yê min hebû. Bi awayekî bêçare û ji hal de ketî dîsa min da ser riya xwe û kir hewar û feryad.

Her ku diçe ez ji taqet dikevim. Ji aliyekî ez di bin barên xwe de didewisîm û ji aliyê din de ez dikim hewar û dibêjim, ji bonî Xwedê alîkariya min bikin! Êdî ez nikarim barên xwe hilgirim. Alîkariya min bikin ez ê bimrim! Bi girî û fîxan hete ku deng di min de heye ez bang dikim. Ji mirovê pêşîn Adem bigre hete yên niha hemî weke min bibar dihatin di ber min re dibuhurîn û diçûn. Tevî ku min ew mirov di wî halî de didîtin jî, min dîsa gazî wan dikir ku bên alîkariya min. Ez dibêjim, "*Wê çi bibe alîkariya min bikin!"*

Mirovekî ku ji ber hewara min nema di ber xwe dide, biken ber bi min ve tê. Ji min re dibêje "*Sebir bike. Ecele meke. Raweste! Xwe rihet bike!"* Ez li vî dengî vedigerim. Ev mirovê xwediyê van gotinan jî wek min barek di himêza wî de û yek jî li nav milên wî ye. Lê dîsa jî li ciyê ku di bin barê xwe de ji hal bikeve, ji min re dibje "*Aram be, xwe rihet bike, ecele meke!"*

Ez şaş dimînim, lê bêferyad û fîxan jî namînim, li ber digerim û dibêjim "Çi dibe alîkariya min bike. Êdî ez *nikarim barên xwe hilgirim. Wê çi bibe hinekî ji barê min bigre da ku ez*

*rihet bibim. Ez dimrim tu jî bahsa rihetbûnê dikî. Ji bonî Xwedê alîkariya min bike.*"

Tevî li ber geriyana min dîsa jî dibêje "*Sebir bike, ecele meke, xwe rihet bike.*" Êdî bi hemî giraniya barên xwe hete ku hêza min heye, dikim hawar, "*Çawa, tu dikarî bêjî?*"

Li ser peyva mêrik a ku ji min re dibêje "*ger tu li pey min bêyî hete dawiya vê riya ku em li ser in ezê karibim alîkariya te bikim, bê tê çawa debar bikeî. Lê ez nikarim çenikî jî ji barên te hilgirim, ji ber ku wek tu jî dibînî yê min jî wekî te di ber sînga min de û li ser milên min jî bar heye. Ger tu bidî ser şopa min, di dawiya vê riyê de em ê karibin bi hev re ji van barên xwe xelas bin.*" Ez dibêjim "*Çawa?*"

Ji min re dibêje, "*Aram be û xwe rihet bike! Çongên xwe bide erdê û konsantre bibe û hemî westiyana xwe ya ji ber barên xwe jibîr bike. Tê bibînî ku çawa rihet dibî. Gava ku tu rihet bûyî, tê dîsa karibî, rabî bidî ser riya xwe. Gava tu westiyayî dîsa çongên xwe bide erdê û xwe rihet bike. Paşê rabe û dîsa bimeşe. Ger hete dawiya vê riyê tu wek min bikî û bidî pey min, her gava ku tu westiyayî ez ê karibim ji te re bêjim bê tê çawa xwe rihet bikî û paşê çawa rabî riya xwe dewam bikî.*"

Ez dibêjim, "*Ez aniha dixwazim ji barên xwe xelas bibim. Hêza min a ku ez di ber xwe bidim nemaye. Ez naxwazim hete dawiya vê riyê bêhna xwe vedim, biwestim, xwe rihet bikim û riya xwe dewam bikim. Ez dixwazim ji barên xwe xelas bim.*" Mêrik ji min re dibêje, "*Ger tu bidî*

*pey min, ez dikarim bêjim ku tê çawa hete dawiya vê riyê herî û bi te re alîkar bim, lê ez nikarim barên te hilgirim. Ji ber ku barên min jî hene!"*

Gava ku min baweriya xwe pê anî ku ev mêrik jî nikare barên min rake û hilgire, ez dîsa dikevim riya xwe. Helbet ji aliyekî ve jî dikim feryad û fîxan. Êdî taqeta min a ku ez pê di berxwe bidim nema. Heye ku ji min hat min xwe da serhev û kir hawar. Bi dengekî jar ez dibêjim, *"Çi dibe, wê çi bibe alîkariya min bikin! Ez di bin barên xwe de dimrim! Alîkariya min bikin da ku ez hinekî din jî bijîm! Ez dimrim!"*

Hîn ez welê bêçare dipelçiqim, ez dengekî ji dûrî ve dibihîzim. "Hê ez li vir im!" Ez li aliyê ku deng jê tê bêhêvî dinêrim. Ji dûrî ve yek bang dike û ber bi min ve tê. Gava min li wî kesê ku pêsî min ew bizorê didît, bi serinc nêrî, min Ew dît. Ji aliyekî ve ber bi min ve tê û ji aliyê din ve bang dike û dibêje, *"Ez li vir im!"*

Ev kesê ku min ew dît ji van hemî kesên ku ji mirovê pêsîn Adem hete yên roja me ku min ew li dora xwe didîtin pir cihê bû. Ji ber ku himêz û ser milên Wî vala, vikîvala qet tu barê wî tunebû!

Ber bi min ve tê. Bi hemî qeweta xwe ya dawîn ku min karibû biserhevdana ez jî ber bi wî ve diçim û li ber digerim û dibêjim, *"Wê çi bibe alîkariya min bike! Ez êdî nikarim barên xwe hilgirim, ez dimirim."* Tê ba min û dibêje, *"Binêre ger tu bixwazî ez dikarim alîkariya te bikim."* Ez jî dibêjim, *"Çi dibe, alîkariyê bike! Êdî ez nikarim barên xwe hilgirim! Ez di bin barên xwe de dimrim!"*

Ji min re dibêje, *"Ger tu bixwazî ez karim barên te ji bo xatirê te hilgirim. Tu dibînî barê min pir sivik e! Dest û milên min vala ne."*

Ez barên xwe didim Wî û Ew ji dêvla min ve hildigre. Êdî ez dikarim ji nû ve bijîm û Ew kes wusa dibêje: *"Ho hemî kesên bargiran û westiyayî! Werin ba min, ez ê huzûrê bidim we. Ez rûnerm û nefsbiçûk im. Têkevin bin nîrê min û ji min fêr bibin, bi vî awayî dê canê we huzûrê bibîne. Nîrê min bi hêsanî tê kisandin, barê ku ez bidim we jî sivik e."*

Ev kes Mesîh Îsa ye ku ji bo bar û cezayê hemî mirovayetiyê hilgire berî niha bi 2000 salan hatiye.

Yê ku cewaba pêsîn ji bo alîkariya min da, yek ji pêxemberan bû. Pêxember jî wek însan hatine rûdinyê, jiyane, guneh kirine û mirine.

Gava ku em li Nivîsên Pîroz dinêrin, em dibînin ku hemî mirov gunehan dikin, hete pêxember jî. Dîsa di Nivîsên Pîroz de hemî pêxember jî di nav de, hemî mirov gunehan dikin û Xwedê bi wî zarê xwe yê sêrîn emir dike ku encama van gunehan jî mirin e.

Pirtûka Pîroz dibêje, *"Herkesî guneh kir û ji mezinahiya Xwedê bêpar ma. Bihayê gunehî mirin e."*

Mirovê duwem jî numûneyeke feylesofan bû ku cereyanên dema nû anîbûn. Kesên ku di nav van cereyanan de cîh girtibûn jî hete dereceyekê rihetiyê didin, lê huzûreke berdewam nikarin bidin.

Gelek oldarên ji mirovê pêşîn Adem hete yên niha, pêxember, feylesof hatin û çûn. Hemî jî ji diya xwe bûn, jiyan, guneh kirin û mirin. Hatin û çûn. Hemî jî ji diya xwe bûn, jiyan, guneh kirin û mirin. Hatin û derbas bûn û çûn. Ger dîrok, Mesîh Îsa wek Reb û Rizgarker ji bo mirovayetiyê Mesîh qebûl neke jî çêbûna Wî ya bêhempa, jiyana wî ya bêhempa, mirin û ji nû ve vejîna wî qebûl dike.

Di Pirtûka Pîroz de hatiye tomarkirin, "*Herkesî guneh kir û ji mezinahiya Xwedê bêpar ma. Kefareta gunehan mirin e. Lê bi wasîteya Rebê me Mesîh Îsa, diyariya Xwedê jiyana herheyî ye.*"

Mesîh Îsa, berî niha bi 2000 salan bi awayekî bêhempa ji diya xwe bûye, jiyaye û miriye. Gora ku termê Mesîh Îsa xistinê, vala ye. Pistî ku ew li çarmîxê xistibûn, pistî sê rojon Îsa ji nav miriyan vejiya û rabû. Îro jî hîn dijî û hîn jî wusa deng li mirovayetiyê dike: "Vejîn û jiyan ez im. Kesê ku bi min bawer bike, ger bimre jî wê bijî."

Çi bigre di ser vejîna Mesîh Îsa ya ji nav miriyan re 2000 sal derbas bûn. Ew îro bi hêza xwe û tesîra xwe ya dunyayî hîn jî dijî.

Di dîrokê de gellek mirovên mezin hene ku dewlet ava kirine, hatine û çûne. Pêxember, hukumdar, zana, ilimdar û oldar hatine û çûne. Lê Îsa, îro hîn jî dijî. Ew kesê herî mezin û bêhempa ye. Ji diya xwe bûna wî û jiyana wî bêhempa ye.

Di Nivîsên Pîroz de: "*Ew ji Meryema bakîre bû.*" Jiyana wî bi hêzeke bêhempa û ne xwezayî tije ye. Jiyaneke pîroz û

bêguneh jiya. Karên nedîtiî yên ku kesî nikaribû pêk baniya û wê pêk bîne, Wî pêk anîn.

Mizgîniya wî bêhempa ye. Ew jiyaneke nû dide kesên ku wî wek Reb û Rizgarker qebûl dikin. Rizgarî û hezkirinê bidest dixe. Li her ciyekî ku mizgîniya wî lê belav dibe; jiyana nû, hêviya nû û ji bo jiyanê armanca nû pêk tê.

Mirina wî ya li ser çarmîxê bêhempa ye. Berî bi 2000 salan Xwedayê Mezin, lawê xwe yê ku bar û cezayê gunehê hemî mirovayetiyê kişand, ji bo ku bibe qurban şand. Ew ji bo hemî mirovayetiyê mir.

Vejîna Wî jî bêhempa ye. Di roja sisiyan a pistî mirina wî de bûyera dîrokî ya ku mirov lê şaş dimîne pêk hat û Mesîh Îsa, ji nav miriyan rabû û vejiya.

Mesîh Îsa îro jî dijî. Ji bo bikeve jiyana kesên baweriya xwe pê anîne, dixwaze gunehên wan efû bike û hêza jiyaneke bimane bide wan. Çunkî weha dibêje: "*Ho hemî kesên westiyayî û barên wan giran, werin ba min û ez ê huzûrê bidim we. Riya bitenê, rastiya bitenê û jiyana bitenê ez im. Bêyî ku ez ji wan re bibim wasîte kesek nikare xwe bighîne Bavê me Xwedê.*"

Incîl dibêje, "*Herkesî guneh kir û ji mezinahiya Xwedê bêpar ma. Bedîlê guneh mirin e. Lê diyariya Xwedê, bi wasîteya Rebê me Mesîh Îsa jiyana herheyî ye.*"

Gava ku Îsa mir barê hemî mirovayetiyê û gunehên wê li ser xwe qebûl kir û li çarmîxê li şûna mirovayetiyê ceze kişand. Niha li kêleka rastê ya yê Ezmanî rûniştiye û bangî hemî

mirovayetiyê dike û dibêje, "*Eve ez li ber derî rawestiya me û li derî dixim. Kî dengê min bibihîze û derî veke, Ez ê bikevim jiyana wî.*"

Ger hûn bixwazin ji rizgariya ku Mesîh Îsa daye îstîfade bikin, hezkirina wî tam bikin û miradê xwe bi jiyana herheyî bikin; divê hûn wî weke cangorîyekî Xwedê yê ku bar û gunehên we hildigre qebûl bikin û bi baweriyeke tam gazî wî bikin ku têkeve jiyana we.

Ger bi rastî jî hûn vê dixwazin û dil dikin; ji Xwedê re dua bikin. Wê wê gavê Mesîh Îsa barê we hilgire û jiyaneke pirr dewlemend bide we.

Ji bo vê daxwaza we ez dikarim duayeke weha pêşniyaz bikim: "*Reb Îsa, ez hewcedarê te me. Ji ber ku tu cezayê bar û gunehê min bikşînî li çarmîxê miriyî, ez ji te re şikir dikim. Bi vekirina deriyê dilê xwe, ez te wek Rizgarker û Rebbê xwe qebûl dikim. Têkeve jiyana min û tu min birêve bibe. Min bike yekî weke ku tu dixwazî.*"

Ger ev dua daxwazên dilê we îfade dike, li ciyê ku hûn lê ne hûn dikarin vê duayê bi baweriyeke tam dubare bikin.

Li gor ku we bi baweriyeke tam, dua kir û Mesîh Îsa vexwend jiyana xwe, hûn karin bawer bikin ku Ew ketiye dilê we. Ji ber ku wî soz daye ku wê bikeve dilê her kesê ku bangî wî bike.

Divê hûn dîsa bawer bin ku hûn ji barê xwe rizgar bûne, gunehên we efû bûne û hûn wek zarokê Xwedê bûne xwediyê jiyana herheyî jî.

Ger hûn dixwazin miradê we bi jiyana bi mane ya ku Mesîh îsa soz daye we û bibin xwediyê xwe û jiyana herheyî, her roj dua bikin û Încîlê bixwînin. Încîlê bixwînin û plana Îsa Mesîh a ji bo we kişf bikin. Bi kesên din ên ku baweriya xwe bi Mesîh Îsa anîne û li ser riya Wî ne re, hev bibînin.

Ji ber ku Xwedê dibêje, "Ez we hergîz bernadim, hergîz terka we nakim, her dem bi we re me. Hete dawiya dinyayê."

Xwedê wusa ji dinyayê hezkir ku lawê xwe yê bitenê di ber de da. Wusa ku ji bo yên baweriya xwe pê tînin, têk neçin û bi miradê xwe û jiyana herheyî şa bibin.

Xwedê Kurê xwe ji bo dinyayê darizêne neşand. Ji bo ku dinya bi alîkariya wî rizgar bibe şand.

# KUPONÊ XWEDEVANAN

Xwendevanên hêja,
Ger weşana me bala we kişand an we jê îstîfade kir ev ê me pir memnûn bike.Hîn gellek kitêb û kitêbokên me yên wek vê hene. Ger hûn lîsteya pirtûkan an broşûra danasînê dixwazin, ji me re binivîsin. Ger pirsên we yên di derheqê baweriyê an mijarên girîng ên weke wê de hebin, em ê li hêviya nameyên we bin. Her xwendevanê me yê ku vê anketê dagire em ê jê re diyariyeke biçûk bişînin.

**Anket-Ji kerema xwe çargoşeyên pêdivî destnîşan bikin.**

1.We zimanê kitêba "Kî dikare te rızgar bike" çawa dît?
☐ Hêsan ☐ Navendî ☐ Zor

2. Temenê we? ☐Ji 18 salî biçûktir 18-25 ☐26-40 ☐Ji 40-î mezintir

3. Rewşa we ya perwerdeyî? Seretayî Navendî Lîse Bilind

4. Zayenda we? ☐ Keç ☐ Mêr

5. Rewşa we ya medenî? ☐ Bekar ☐ Zewicî

6. Ez dixwazim hûn dersên kursa xwe ya İncîlê bêpere li ser navnîşana min rêkin? ☐ Erê ☐ Na

7. Ez dixwazim hûn lîsteya xwe ya pritûkan û broşura xwe ya danasînê liser navnîşana min bişînin. ☐ Erê ☐ Na

Nav, Nasnav:..........................................................................................

Navnîşan:................................................................................................

...............................................................................................................

Bajar:......................................................................................................

Jı kerema xwe rûpelî jê bikin an fotokopiya wî bikşînin û bişînin navnîşana:

**P.K. 8 Acıbadem**
**Kadıköy - İstanbul**

# BAZI KİTAPLARIMIZ





Kitap listemizi ve kitaplarımızı adresimizden isteyebilirsiniz.

**Müjde Yayıncılık Ltd. Şti.**

P.K: 173 Acıbadem 81020 / İstanbul


Tel/Fax: (216) 349 85 29







Dünyada 6 ayrı dile çevrilerek binlerce basılan bu kitabı ve büyük sıkıntılar sonunda, dünyaya gelen ve hayatta kalabilmek için yaşama savaşı veren bir bebeğin mucizelerle dolu hikayesinin yer aldığı bu kitabı adresimizden ödemeli olarak edinebilirsiniz.




Mustafa EFE has had his testimony booklet "Why I Become A Christian" translated into 7 languages. You can buy his testimony booklet or other books (in Turkish) by writing to our address.

# KÎ DİKARE TE RİZGAR BİKE?



Li ber min ewqas kar hene
ku ez nizanim ez kîjanî
bibijerîm û herim kîjanî? Belê
ez tişteki dizanim;
ew jî divê ez rûnêm û bi hûrî
li ser her tiştî bifikirim. Ez
dixwazim gava ku ez di
vê riyê de herim
neterpilim û nekevim.

Mustafa Efe

480-31.19

ISBN 975788989-X
9 789757 889892